


Ermenî li "Şoreşa Rojava" xwedî derdikevin

DÎHA - Gel di avakirina şoreşa Rojava ya wek modeleke pêkvejiyana bawerî û gelan tê dîtin de cih digirin. Gelê Ermenî di yek ji sazîbûna bihêz, meclîsan de bi awayekî aktîf cih digirin. Yek ji nûnerên Ermeniyan Alîkarê Şaredariya Qamişlo Nubar Hagof got, "Nêzî 40 salan gelên Sûriyeyê ji her tiştî bêpar bûn. Wek gelên Mesîhî ji bo yekîtiya gelan an jî ji bo avakirina Rêveberiya Demkî ya Rojava çi ji destê me bê em amade ne bikin. Heke em bibin yek azadî nêzîk e."



Li Rojava ku gelên wek kurd, ereb, çeçen û xirîstiyan ligelhev têkoşînê pêş dixin bajarên xwe ji nû ve ava bikin. Alîkarê Şaredarê Qamişlo Nubar Hagof ê bi eslê xwe ermenî û di şoreşa Rojava de bi awayekî aktîf cih digire diyar kir ku bi gel û baweriyên Rojava re tu pirsgirêkên wan nîn in.

'Yên nebin yek wê tune bibin'

Hagof da xuyakirin ku êdî yên li Rojava tevlî yekîtiyê nebin û nebin yek wê marjînal bimînin û wê ber bi tunebûnê ve biçin. Hagof axaftina xwe wiha domand: "Ji ber ku ji her cihî êrîş pêk tên. "Nêzî 40 salan gelên Sûriyeyê ji her tiştî bêpar bûn. Wek gelên Mesîhî ji bo yekîtiya gelan an jî ji bo avakirina Rêveberiya Demkî ya Rojava çi ji destê me bê em amade ne bikin. Heke em bibin yek azadî nêzîk e."

'Bi saya şehîdan em gihiştin vir'

Hagof, destnîşan kir ku nêzî 3 salan e li Rojava şoreşek heye û di wê pêvajoyê de YPG û YPJ'ê berxwedaneke bêhempa nîşan da. Hagof, anî ziman ku di vê berxwedanê de gelek wendahî dane û axaftina xwe wiha bi dawî kir, "Em li hember şehîdan bejna xwe ditewînin. Bi saya şehîdan em gihiştin vê astê."

Demîrtaş: Bila kes nepê ku Ocalan di hawizê vala de avjeniyê bike

Hevserokê Giştî yê BDP'ê Selahattin Demirtaş diyar kir ku dewlet, rol û misyona ku gelê kurd û PKK li ser Ocalan bar kiriye baş zane û wiha got: "Ji ber vê yekê divê berî her tiştî dewlet sekn û usluba xwe ya li hemberi Birêz Ocalan baş bike. Birêz Ocalan di nava van şert û mercan de dê çawa karibe muzakereyan pêş bixe. Birêz Ocalan bi xwe jî dibêje ez nikarin di hawizê bê av de avjeniyê bikim. Bila kes ji Birêz Abdullah Ocalan nepê ku di hawizê vala de avjeniyê bike. "



DÎHA - Hevserokê Giştî yê BDP'ê Selehattîn Demîrtaş, di civina Navenda Lêkolîna Civakî ya Dicleyê (DİTAM) a bi boneya pevajoya çareseriya demokratîk ku di pirsgireka kurd de rolek çawa dîtiye niqaş bikin, bi navê Diyalogên TİGRİS'ê pêk anî. Civîna diyalogê li Otela Gren Parkê pêk hat. Di civîna bi navê "Civînên Tigrisê û pêvajoya çareseriyê" pêk hat de Hevserokê Giştî yê BDP'ê Selahattin Demîrtaş, Akademisyen Mîthat Sancar û gelek nûnerên saziyên civakî amade bûn. Hat diyarkirin ku dê civîna duyemîn a diyalog û çareseriyê bi Wezîrê Dadê Sadullah Ergin re pêk bê.

Ewil Serokê DÎTAM'ê Mehmet Kaya axivî û wiha got: "Ji bo em rewşa pêvajoyê û bi aliyên pêvajoyê dimeşînin re hevdîtin pêk bînin em vê civînê pêk tînin. Berê jî di navbera gelê kurd û tirk de ev hevditin pêk hatin. Em vê pêvajoya ku hatiye destpêkirin erênî dibînin. Em vê pêvajoya ku Birêz Ocalan û Erdogan daye destpêkirin pir girîng dibînin. Ji bo ev pêvajo pêş bikeve çi bikeve ser milê me em dê bikin. Em dê hemû berpirsiyariyê bidin ser xwe. Ji bo di vê pêvajoyê de aştî pêş bikeve divê diyalog pêş bikeve."

Kaya, xwest pirsgirêka kurd weki pirsgirêka ewlehiyê neyê dîtin û pirsgirêk wekî pirsgirêka siyasî, çandî û civakî bê dîtin.

Hevserokê Giştî yê BDP'ê Selahattin Demîrtaş jî anî ziman ku ew ji pêvajoya ku niqaşên "Kurt hene ya na? hatin pêvajoya îro û wiha got: "Niha em niqaşa kurd dê di siyaseta Rojhilata Navîn de cihekî çawa bigirin niqaş dikin. Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û Serokwezîrê Tirkiyeyê Erdoğan înisiyatif girtin dest û ev pêvajo di meha cotmeh dan destpêkirin. Îro heyetên me yên siyasî diçin îmraliyê û tên. Heyetên dewletê jî diçin Îmraliyê û tên. Hemû heyetên bi Birêz Ocalan re hevdîtinê pêk tînin hemû di bin qeydan de pêk tên. Rê roj bê hemû qeyd ji aliyê her kesî ve bê temaşekirin."

'Divê hemû kesên xwedî aqil piştgiriyê bidin vê pêvajoyê'

Demîrtaş, destnîşan kir ku ev hevdîtinên tên kirin pir girîng in û wiha berdewam kir: "Pir girîng e ku em bi muxatabên pirsgirêkê re hevdîtin bikin. Ger ku mirov dest bi karekî kir divê wî karî biqedîne û çareser bike. Ger ku hatibe destpêkirin dê biqede jî. Divê hemû kesên xwedî aqil û raman piştgiriye bidin vê pêvajoyê. Hemû kesên li dijî axaftin û diyalogê pêşniyarên wan ên wekî din hene gelo? Me di Oslo de dît. Siyaset li ser hevî û bendewariyê pêş nakeve. Ger ku mase rabe diyalog jî radibe. Em naxwazin ev diyalog bi dawî bibe. Ji bo ku diyalog pêş bikevin çi ji destê me bê em dê bikin."

Demîrtaş, destnîşan kir ku manîfestoya "Rizgariya Demokratîk û Jiyana Azad" a ji aliyê Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan ve di Newroza Amedê de hat weşandin, ji bo bibe çareseriya Rojhilata Navîn e û wiha got: "Birêz Ocalan di Newrozê de ji bo çareseriya Rojhilata Navîn ev manîfesto weşand. Di mutabakatek hevpar de ev hat amadekirin. Divê gelê kurd û tirk vê yekê zanibe."

'Em hatin pêvajoya muzakereyê'

Demîrtaş, da zanîn ku di civîna dawî ya bi Rêberê PKK'ê Ocalan re, Ocalan gotibû ku ew di pêvajoya ku kesî winda nekiriye dene û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Ya herî hêsan em gihiştin pêvajoya muzakereyan. Hevdîtina ku hikûmet bi Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan re pêk tîne girîng e."

Demîrtaş, destnîşan kir ku Serokwezîr Erdogan dibêje îro dayik nagirin, lê behsa keda Ocalan nake. Ma ji bilî Erdogan qet ked û para Birêiz Ocalan PKK û BDP'ê tune? Divê ev bê rastkirin û famkirin. Dewlet, rol û misyona ku gelê kurd û PKK li ser Ocalan bar kiriye baş zane. Ji ber vê yekê divê berî her tiştî dewlet sekn û usluba xwe ya li hemberi Birêz Ocalan baş bike. Birêz Ocalan di nava van şert û mercan de dê çawa karibe muzakereyan pêş bixe. Birêz Ocalan bi xwe jî dibêje ez nikarin di hawizê bê av de avjeniyê bikim. Bila kes ji Birêz Abdullah Ocalan nepê ku di hawizê vala de avjeniyê bike. Divê şert û mercên Ocalan bên başkirin.



Çalakiyên Dayikên Şemiyê li Şemzînanê jî dest pê dikin

DÎHA - Di çarçoveya xebatên ÎHD'ê yên têkildarî kesên winda yên di bin çavan de û cinayetên kiryar nediyar de li Şemzînanê jî her hefte wê çalakiyên Dayikên Şemiyê pêk bên.

Komîsyona ku ji bo kesên wenda yên di bin çavan de hatine wendakirin û bi awayekî kiryar nediyar hatine qetilkirin bên lêkolînkirin ji aliyê Komeleya Mafê Mirovan ÎHD'ê şaxên Amed û Colemêrgê hat avakirin dest bi xebatan kir. Berdevkê Komîsyonê û Rêvebera ÎHD'ê Şaxa Amedê Necîbe Perînçek, nûnerên ÎHD'ê yên Colemêrg û Şemzînan têkildarî xebatan li Rêxistina Navçeyê ya ya BDP'ê civînek li dar xistin.

Necîbe Guneş Perînçek a di civînê de axivî diyar kir ku wê kesên di bin çavan de hatine wendakirin û yên bi awayekî kiryar nediyar hatine qetilkirin lêkolîn bikin û wiha got, "Di hefteya pêşiya me de wê çalakiyên Dayikên Şemiyê li Şemzînanê jî pêk werin."

Ji neviyên Şêx Seîd: Em di nava sîsika vê tevgerê dene



DÎHA - Bi tevlêbûna neviyên Şêx Saîd ên ji Erzirom, Xerpêt, Çewlîk, Amed û bajarên din, li avahiya KCD'ê civina çapemeniyê li dar xistin. Di civînê de Parlamenterên BDP'ê Nursel Aydogan, Husamettîn Zenderlîoglu, Halîl Aksoy, Hevseroka KCD'ê Aysel Tugluk, neviyên Şêx Abdurahman Behram Bîlgîn û Neviyê Şêy Saîd Diyadin Firat û endamê komîteya Baweriyê ya KCD'ê amade bûn. Di civînê de Neviyê Şêx Abdurahman Behram Bîlgîn, diyar kir ku gelê kurd nêzî sed salin ji aliyê hêzên serdest ve mafê wan û nasnameya wan tê binpêkirin û rastî polîtîkayên înkar û îmhayêtên. Bîlgîn, da zanîn ku gelê kurd bi sedsalan in di qada siyasî, çandî, aborî û hemû qadên din de mafê wan ji destê wan hatiye derxistin û zor û zahletiyên gelek mezin dijîn. Bîlgîn, destnîşan kir ku li gel hemû van neheqiyan dîsa gelê kurd têkoşîna heq, hiqûq, rûmet û azadiyê dimeşîne û gihiştiye vê astê.

'Divê hevdîtinên bi Ocalan re vegerin muzakereyan'

Bîlgin, xwest êdî hevdîtinên bi Abdullah Ocalan vegerin muzakereyan û wiha berdewam kir: "Rêveberiyek li Herêma Federela a Kurdistanê hatiye avakirin. Piştî vê rêveberiyê li Rojhilat têkoşîn didome. Dîsa li Rojavayê Kurdistanê Şoreşa gelan hatiye destpêkirin. Li Rojava têkoşîna yekîtî, azadî û wekheviyê rê li pêş diyalog û muzakereya Bakur dike. Ev geşedanên Rojava heviyê didin bakur. Li Rojava tiştê ku lezgîn pêwist e divê berî her tiştî yekîtiya di nava kurdan de pêş bikeve. Em destkeftiyên li Rojava wekî destkeftiyên hemû kurdan dibînin. êrîşên li dijî gelên Rojava di heman demê de li dijî hemû gelên kurd pêk tên. Êrişên çeteyên El Nusra li dijî gelê kurd berdewam dike. Em hevî dikin ku hemû gelên li Rojava dê bigêjin aramî û serfiraziya xwe."

'Namzetên BDP'ê namzetên yekîtiyê ye'

Bîlgîn, di berdewama daxuyaniyê de destnîşan kir ku xebatên Kongreya Neteweya Kurd pir girîng in û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Ji bo tifaq û yekîtîya gelê kurd ev hewldana Kongreya Neteweyi pir girîng e. Divê em jî wekî her netew û miletekî ji bo nirxên xwe yên civakî û nijadî di nava hewldan û parastinê de bin. Di vî alî de li ser kes kesî berpirsiyariyek dikeve." Neviyê Şex Abdurrahman Behram Bîlgîn wiha got: "Wekî Şêx Said Efendî gotiye 'Em ne li serî û ne jî li dawiyê, di nava sîsika vê tevgerê dene'." Neviyê Şêx Saîd Diyadin Firat jî anî ziman ku ew heta dawî li pişt Şoreşa Rojava ne. Hevseroka KCD'ê Aysel Tugluk jî anî ziman ku ew dê her dem li gel malbatên Şêx Saîd û Şêx Abdurrahman cih bigirin.